KT

Zanîngeha Mardîn Artukluyê

Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkiyeyê

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez

# BIKARANÎNA RENGDÊRAN DI DEVOKA MÊRDÎN-KOSERÊ DA

Îdrîs KILIÇ

15721061

Şêwirmend

Mustafa ASLAN

MÊRDÎN 2016

KT

Zanîngeha Mardîn Artukluyê

Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkiyeyê

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez

# BIKARANÎNA RENGDÊRAN DI DEVOKA -KOSERÊ (MÊRDÎN) DE

Îdrîs KILIÇ

15721061

Şêwirmend

Yard. Doç. Dr. Mustafa ASLAN

Mêrdîn 2016

**NAVEROK**……………………………………………………………………...1

**KURTE**………………………………………………………………………….5

**ÖZET**……………………………………………………………………………6

**PÊŞGOTİN**…………………………….………………………….....................7

**KURTEBÊJE**.........................................................................................................8

**DESTPÊK**…………………………………………………………………........9

**BEŞA YEKEM**

**RENGDÊR**

**1.RENGDÊR**………...……………...………………………………….….……...10

**1.1.Rengdêrên Çawaniyê**..…………..…………………………………...…..…...10

**1.1.1.**Rengdêrên Namdariyê…….………………………….…………..……..…..11

**1.2. RENGDÊRÊN DİYARKER**………………………………….…..…..……11

**1.2.1.**Rengdêrên Nîşaniyê.………………………….…………………..……... 11

**1.2.2.**Rengdêrên Jimarîn…………………………………………..……...…….12

**1.2.2.1.**RengdêrênJimarin yên Resen……………………………………………..12

**1.2.2.2.**Rengdêrên Jimarîn yên Rêzîn…………………………………….…….12

**1.2.2.3.** Rengdêrên Jimarîn yên Dabeşiyê……………………………….….…13

**1.2.2.4.** Rengdêrên Jimarîn yên Kesrî…………………………………………..…13

**1.2.3.**Rengdêrên Nediyar……………………………………………...….….…13

**1.2.4.** Rengdêrên Pirsiyariyê ……………………………………….……..........14

**1.3.**RAVEKÊN RENGDÊRAN…………………………………...….…….......14

**1.4.**PAYEYA RENGDÊRAN ……………………………………………………14

**1.4.1.**Bi Qertafan………………………………………….…………………15

**1.4.2.**Paybi peyvan…………………………………………….……………15

**1.5.BIÇÛKIRINA RENGDÊRAN**……………………………….……….......15

**1.6.**PERÇÎN KİRİNA RENGDÊRAN ………………………………..…….16

**1.7.**SAZBÛNA RENGDÊRAN…………………………………………......17

**1.7.1.**Rengdêrên Xwerû………………………………………………….…..17

**1.7.2.**Rengdêrên Darîştî…..………………………………………………..…17

**1.7.2.1.**Bi Alîkirina Pêşgiran………………………………………………….…..17

**1.7.2.1.**Bi Alîkirina Paşgiran…………………………………………….…..17

**1.7.3.**Rengdêrên Hevdudanî………………...…………………….…………18

**BEŞA DUYEM**

**ÇÎROKÊN XEBATÊ**

**2.1.MELE BEZA**………………………………………………........................19

**BEŞA SÊYEM**

**DI ÇÎROKAN DE NÎŞANDANA RENGDÊRAN**

**3.1.Di ÇÎROKA MELE BEZA DE RENGDÊR**…….…………………...…….......23

**3.1.1.** Rengdêrên Çawaniyê……………………………………………….....23

**3.1.1.1.**Rengdêrên Namdariyê……………………………………………………........…..23

**3.1.2.**Rengdêrên Diyarker…...……………………………………………………...…23

**3.1.2.1.**Rengdêrên Nîşanîyê………………………………………………………………23

**3.1.2.2.**Rengdêrên Jimarîn………………………………………………………...…23

**3.1.2.2.1.**Rengdêrên Jimarîn yên Resen…….…………………………………….….23

**3.1.2.2.2.**Rengdêrên Jimarîn yên Kesrî………………………………………....…...23

**3.1.2.2.3.**Rengdêrên Nediyar……………………………………………………..…….23

**3.1.2.2.4.**Rengdêrên Pirsiyariyê...……………………………………………...…..23

**3.1.3.**Ravekên Rengdêran…………………………….…………………..………......24

**3.1.4.**Li gor Sazbûna Xwe Rengdêr……………….……………………..………......24

**3.1.4.1.** Rengdêrên Xwerû…………………….…………………………….………....24

**3.1.4.2.** Rengdêrên Darijtî………………….………………..…………………24

**3.1. 4.3.** Rengdêrên Hevdûdanî………………...………………..…………….......24

**ENCAM**………………………………………………………………………….….…25

**PÊVEK**………………………………………………………………….……..….....26

**ÇAVKANÎ**……………………………………………………………….....……...27

**VEBÊJÊ ÇÎROKÊ**…………………………………………………….....……......28

# KURTE

Armanca vê xebatê di devoka Koser (Mêrdîn) de bi hemû awayên xwe ve tespîtkirin û sinifandina hevalnavan e. Berî vê lêkolînê bi hemû awayan ve hevalnavên kurmancî beşa yekemîn de hatin danîn û sinifandin. Di vê xebatê de çavkaniyên giring yên li ser rêzimana kurmancî hatine kirin ji rê û rêbazên vê xebatê didine diyarkirin. Pistre çîrokek devoka Mêrdîn hatin qeydkirin û nîvîsandin. Piştre hevalnavên di vê çîrokê de hatin tespîtkirin û di bin serenavên ku hevalnav hatine sinifandin yek bi yek mînak ve hatin danîn.



**Bêjeyên sereke:** Kurmancî, hevalnav, çîrok, Mêrdîn(Koser)

# ÖZET

## MARDİN AĞZINDA SIFATLARIN DURUMU VE SINIFLANDIRILMASI

Bu çalışmanın amacı Mardin ağzında sıfatların bütün şekil ve türleriyle tespit edilmesi ve sınıflandırılmasıdır. Bu çalışmadan önce Kürtçedeki sıfatlar bütün özellikleriyle yazılmış ve sınıflandırılmıştır. Bu çalışmada Kürtçe grameri üzerine yapılmış önemli kaynaklar yol ve yöntem konunu aydınlatmıştır. Sonrasında Mardin ağzındaki bir hikaye kaydedildi ve yazıldı. Daha sonra ise bu hikâyedeki sıfatlar, sıfatlar üzerine yapılmış olan sınıflandırmanın başlıkları altında tek tek gösterildi.



**Anahtar sözcükler:** Kürtçe, sıfatlar, Mardin(Kızıltepe) ağzı, hikâye.

## PÊŞGOTIN

Armanca vê xebatê di devoka Mêrdîn (Koser) de bi hemû awayên xwe ve tespîtkirin û sinifandina hevalnavan e. Berî vê lêkolînê bi hemû awayan ve hevalnavên kurmancî beşa yekemîn de hatin danîn û sinifandin.

Di vê xebatê de ji çavkaniyên girîng yên li ser rêzimana kurmancî hatiye îstîfadekirin, Pistre hin çîrokên devoka Mêrdîn ê hatine qeydkirin û nîvîsandin. Rengdêrên di van çîrokan de hatin tespîtkirin. Ev rengdêr di bin serenavên ku rengdêr hatine sinifandin yek bi yek mînak ve hatin danîn.

Ev xebat li ser çîrokên devoka Koser (Mêrdîn) hatiye kirin. Ev çîrok du kesan gotine. Çîrok 2016 an de hatine keyd kirin. Di derbaskirina nivîse de çi tişt ne hatiye guhertin. Ev xebate li ser çîrokekê hatiye kirin.

Xebat ji sê beşan pêk tê. Beşa yekemîn sinifandina rengdêrên kurmancî li ser serenavan li gor çavkaniyên girîng hatiye dayîn. Beşa duyem çîroka hatine keydkirin hatine nivîsîn. Beşa sêyem di van çîrokan de rengdêrên derbasbûyî hatine tespîtkirin û nivîsîn.

Ji ber ku şêwirmendî û alîkariya min gelek bi sebir kiriye spasiya xwe ji mamoste Mikail BULBUL re dikim. Ji bo berhevkirina çîrokê ji pismamê xwe Hüsamedin KILIÇ û Dotmamaxwe Fatima  KILINÇ sipas darim.

**Mêrdîn 2016**

## KURTEBÊJE

**bnr.** **:** binhêrin

**hwd.** **:** her wekî din

**r.** **:** rûpel

**ç.** **:** çîrok

## DESTPÊK

Mebesta wê çîrokê cudatiya rengdêrên devoka Mêrdîn-Koserê diyarkirin e. Ji bo analîzê beşa yekem da teoriya rengdêran hatiye danin piştre di çîrokan de rengdêr hatine diyar kirin. Di wê xebatê de çîrokek hatine bikar anîn. Di vê çîrokê de 1893 bêje hene. Di nav van bêjeyan de bêjeyên rengdêr hatine tespît kirin. Encama wê xebatê di beşa sêyem de di bin serenavên rengdêran de hatiya nîşandan.

Çîrokên hatine berhevkirin di herêma Mêrdînê navçeya Koserê têne vegotin. Ji ber ku gelek cihan de cudatiyên devoka Koserê û Mêrdînê jî hene ev xebate ji bo taybetmendiyên devoka Koserê gelek grîng e. Ew cudatî jî ber têkiliyên herêma Koserê û herêmên devdora wê tên.

Wê çîroka bi navê Mele beza hatiye gotin li gorî naverokê hatiye binavkirin. Çîrok ser hev 13 deqiqeyan dikşîni. Vebêjerê çîrokê Fatima KILINÇ'e. Niha 48 Salî ye, ne xwende ye û ew çîroka di zarokatiya xwe de ji diya xwe, gundê Mesta ku girêdayî Koserê ye guhdarî kiriye. Ew çîrok 2016'an de hatiye berhev kirin

## BEŞA YÊKEM

### 1.RENGDÊR

Rengdêr; rengê, şiklê navdêran hejmara wan diyar dikin.[1] Celadet Alî Bedîxan rengdêr bikar aniye; lê hinek zimanzan peywa "hevalnev"ê bikar tînin.[2] Lê emê peyva rengdêrê ji ber ku xurtir e bikar bînin.

**Nîşe :** Rendêr li gorî wate û peywira xwe dibin du beş.

#### 1.1.RENGDÊRÊN ÇAWANIYÊ

Ev cure Rengdêr; reng,rewş,teşe û jêçêbûna navdêran diyar dikin.

**Rewş:**

- Jinika pîr
- pola qirêj
- keçika xweşik

**Reng:**

- Pênûsa sor
- mirîşka reş
- pêlava gewr

**Teşe:**

- Deriyê xwar
- topa çargoşe
- pênûsa stûr

**Jêçêbûn:**

- Deriyê darîn
- xencera zêrîn
- şala hirî

---

[1] Abdullah Încekan Ez Kurdî Hîndibim- Pratik Kürtçe Dersleri, Nûbihar, Aralık 2010 Stenbol r.53

[2] Sami Tan Rêzimana Kurmancî, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Adar 2011, r. 159

### 1.1.1.Rengdêrên Namdariyê

Ev rengdêre ji rengdêrên çawaniyê ne. Asta civakî ya navên taybet nîşan didin.[3]

**Mînak:**

- Kek Ehmed
- Xalê Reşo
- Xaltika Îsra
- Nûriyê Necar
- Evîn Xanim
- Xwişka Neslîxan

**Hişyarî:** Peyvên mîna "xaltî, xal, ap" dema ku weke rendêrên namdariyê jî û mîna navdêrê jî bin bi heman awayî çê dibin.Dîsa di hin bikaranîn din jî de ev tevlihevî çê dibe.

**Mînak:**

- Xaltîka Eyşeyê (raveka hevalnavî, xaltîk Eyşe bixwe ye)
- Xaltîka Eyşeyê (raveka navdêrî, xaltîk ya Eyşe'yê ye)
- Kûçikê Beşîr (raveka hevalnavî,kûçik Beşîr bixwe ye)
- Kûçikê Beşîr (raveka navdêrî,kûçik yê Beşîr e)

**Nîşe:** Carinan rendêr tê pêşiya peyvê jî.

**Mînak:**

- Ew xweş mirov e.

## 1.2. RENGDÊRÊN DIYARKER

Ev rengdêr; navdêran ji aliyê pirsê, nediyariyê, nîşandanê, û hejmarê didine xuya kirin.

### 1.2.1.Rengdêrên Nîşaniyê

Gava cinavkên nîşanîyê têne beriya navdêrekê û wê îşaret dikin, dibin rengdêrên nîşaniyê.[4]

Rengdêra nîşaniyê ya "ev" navdêrên nêzîk, rengdêra nîşaniyê ya "ew" navdêrên dur nîşan dide.[5] Formên van rengdêran yên xwerû û tewandî hene.[6]

---

[3] Mikail Bülbül & Bahoz Baran, Rêzimana Kuramncî Enstîtuya Kurdî ya Amedê, 2008, r42

[4] Çetin Taş, Waneyên Rêziman û Rastnivîsa Kurmancî, Dîwan, Stenbol 2013, r.98

**Mînak:**

- Vê keçikê xwend
- Vî kevirî ji vir rake
- Wî xortî dibînim
- Wê hevalê çi xwest ?
- Van daran nabirin
- Wan xwendekaran kêfa min anîn
- Ev dinya bi min pir xweş e
- Ew mamoste nema hat

**Hişyarî:** Divê cînavkên nîşanî û rendêrên nîşanî neyên tevlihev kirin. Cînavkên nîşanî rasterast cihê navan digirin; lê rendêrên nîşanî tên pêşiya navdêran û wan dinimînin.

**Mînak:**

- Ew Heval çi dike?( peyva "ew" peyva "heval" nîşan dide û rendêr e)
- Ew çi dike (peyva "ew" ciyê "heval" girtiye û cînavk e)

**1.2.2. Rengdêrên Jimarîn**

Ev hevalanav navan lî gorî mêjerê diyar dikin.[7]

Ev rengdêr dibin çar beş:

**1.2.2.1.Rengdêrên Jimarîn yên Resen**

Hejmara navdêran nîşan dike.

**Mînak:**

- Deh dar
- Pênc şerwan
- Bîst milyon

1**.2.2.2. Rengdêrên Jimarîn yên Rêzîn**

Reza navdêran nîşan didin. Bi qertafên parkît yên –an, ,em, -em-în çê dibin, piştî navdêran tên.[8]

**Mînak:**

---

[5] Sami Tan Rêzimana Kurmancî, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Adar 2011, r.170
[6] Prof. Dr. Kadri Yildirim Kûrtçe Dil Bilgisi, Mardin Artuklu Üniversitesi Yayınları, Eylül 2012, r.257
[7] Prof. Dr. Kadri Yildirim Kûrtçe Dil Bilgisi, Mardin Artuklu Üniversitesi Yayınları, Eylül 2012, r.260
[8] Kamuran Bedırxan, Kolay Kürtçe, Doz Yayınları, r.125

- Mala çaran
- Mala çaremin
- Dersa sêyem
- Dersa şeşemîn
- Pirsa heftemin

**1.2.2.3. Rengdêrên Jimarîn yên Dabeşiyê**

Parvekirina navdêran diyar dikin.[9]

**Mînak:**

- Rêzên çar çar
- Guliyên şeş bi şeş
- Darên heft û heft

**Nîşe:** Ev hejmarên ku hatine dubarekirin dema ku aresteyî lêkeran bibin dibin hoker.

**Mînak:**

**1.2.2.4. Rengdêrên Jimarîn yên Kesrî**

**Mînak:**

- Nîv nan kirî
- Min ribik hîsse kirî

**1.2.3.Rengdêrên Nediyar**

Cînavkên nediyar gava tên beriya navdêran dibin rengdêrên nediyar.[10]

**Mînak:**

- Gelek kes hatin serdana me
- Hin mirov gêj bûne
- Hemû xwendekar dersê dibînin
- Tu kes nikare bi me

**Hişyarî:** Divê rendêr nediyar û cînavkên nediyar neyên tevlihevkirin.

**Mînak:**

- Hemû kes hatin ( peyva hemû berî navdêrê hatiye û rendêr e.)

---

[9] Mikail Bülbül & Bahoz Baran, Rêzimana Kuramncî Enstîtuya Kurdî ya Amadê, 2008, r43
[10] Sami Tan Rêzimana Kurmancî, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Adar 2011, r.175

- Hemû hatin ( peyva hemû, şûna kesan girtiye û cînavk e.)

**1.2.4. Rengdêrên Pirsiyariyê**

Ev rengdêr ji navdêran dipirsin. Bersiva wan dîsa rengdêr in.[11]

**Mînak:**

- Te çend nan xwar ?
- Kîjan çiya bilind e ?
- Karê çawa rind e ?
- Çiqas pirtûk lazim in ?

**Hişyarî:** Divê rendêrên pirsiyariyê û cînavkên pirsiyariyê neyên tevlihevkirin.

**Mînak:**

- Te çend nan xwar? (peyva çend berî nan hatiye û rendêr e.)
- Te çend xwar? (peyva çend şûna navdêrekî girtiye û cînavk e.)

**1.3.Ravekên Rengdêran**

Rengdêr di ravekan de rewşa raveberê diyar dikin.[12]

**Mînak:**

- Sêva sor
- Deriyê mezin
- Çar sêv

– Dibe ku du an jî pirtir rendêr navekî binimînin.

**Mînak:**

- Mirovê jîr û xebatkar

– Hinek rendêr hene ku hêdî hêdî, ravebera xwe winda dikin û êdî di şûna navekî de tên bikaranîn.

**Mînak:**

- Mirovên pîr bi rê de dimeşin → Pîr bi rê de dimeşin.
- Keçika xweşik di ber me re derbas bû → Xweşik, di ber me re derbas bû.

**1.4.Payeya Rengdêran**

Paye asta navdêran û rewşa wan li hemberê navdêrên din nîşan didin. Bi payeya asayî, payeya hevûkirinê û payeya baerztir dibin sê beş.[13]

[11] Mikail Bülbül & Bahoz Baran, Rêzimana Kuramncî Enstîtuya Kurdî ya Amadê, 2008, r.44
[12] Mikail Bülbül & Bahoz Baran, Rêzimana Kuramncî Enstîtuya Kurdî ya Amadê, 2008, r44

**1.4.1- Bi qertafan**

**-tir:** Ev qertaf dema ku bê rendêran wateya "bêtir" dide wan.

**Mînak:**

- Zarokên xweşiktir
- Kuçeya paqijtir

**-tirîn:** Ev qertaf dema ku bê rendêran wateya "herî bêtir"dide.

**Mînak:**

- Zarokê xweşiktirîn
- Kuçeya paqijtirîn

**1.4.2 – Bi peyvan**

**Bi qasî (wek, wekî):** Ev peyv jî wateya wekheviyê dide rendêrê

**Mînak:**

- Marê weke şerîtê mezin
- Zarokên bi qasî axê pir

**Gelek, pir, zehf, zor…:** Ev peyv jî dema ku tên beriya rendêran wateya wan ji hêla zêdebûnê ve xurtir dikin.

**Mînak:**

- Zarokên baş→zarokên pir baş
- Welatê xweş→ welatê zehf xweş

**Herî:** Ev peyv jî dema ku tê beriya rendêran asta rûberiyê bilindtir dike.

**Mînak:**

- Zarokê baş→ zarokê herî baş

## 1.5.BİÇÛKİRİNA RENGDÊRAN

Parkîtên -e-ik,-ok,-ek,-kok tên daviya rengdêran û wateya biçûkirinê didinê.[14]

**Mînak:**

- Keçika zer**e**
- Xwendevanê sor**e**
- Miya şîn**e**
- Keçika zer**ik**
- Xwendekarê sor**ik**

[13] Sami Tan Rêzimana Kurmancî, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Adar 2011, r.257
[14] Celadet Alî Bedirxan & Roger Lescot, Kürtçe Gramer, Avesta Yayınları, 2009 İstanbul, r.214

- Miya şîn**ik**

Bi peyvên mîna "**piç, hin, heb, parî**…" jî biçûkirin çê dibe, dema qertafa –**ik**'ê jî bistînin bêtir biçûk dibin.

**Mînak:**

- Piçek nan → Piçikek nan
- Hebek tirî → Hebikek tirî
- Hinek av → Hinikek av

1.**6. PERÇÎNKİRİNA RENDÊRAN**

Perçînkirin ew tişt e ku mirov wateya peyvê an jî peyvan xurtir dike. Bi qertafên mîna -**ip**, -**ipî**, -**im**'ê perçînkirin çê dibe. Tîpa serê peyvê tê berî van qertafan û dîsa bi peyvê re tên bikaranîn. Bêtir bi qertafa –**ipî** tên çêkirin.

**Mînak:**

| **tîpa serî** | **qertafa** | **pev** | **peyva perçînkirî** |
|---|---|---|---|
| S | ipî | sar | sipîsar |
| T | ipî | tarî | tipîtarî |
| R | ipî | rast | ripîrast |
| G | ip | germ | gipgerm |
| S | im | sipî | simspî |

**Nîşe:** Di Kurmancî de perçînkirin bi peyvên dubestî jî çê dibe:

**Mînak:**

- Zarokê şilfûtazî
- Zilamê şilopilo
- Welatê tarumar

## 1.7.SAZBÛNA RENGDÊRAN

Rengdêr li gorî sazbûna xwe , (xwerû, darîştî, hewdûdanî) sê beş in.[15]

### 1.7.1. Rengdêrên Xwerû

Ev rengdêr kok in, qertaf nestandîne.

**Mînak:**

- Psîka reş
- Dara mezin
- Keçika xweş
- Mêrikê kor

### 1.7.2. Rengdêrên Darîştî

Ev rengdêr bi parkît û pêrkîtan çê dibin.

**Mînak:**

#### 1.7.2.1 – Bi Alîkariya Pêşgiran

- Keçika **bê**nesîb
- Zarokên **bi**hêvî
- Qedera **bê**bext
- Xwendekarên **ne**zan

#### 1.7.2.2 – Bi Alîkariya Paşgiran

- Mirovê nêçîr**van**
- Însanên guh**dar**
- Dariyê dar**în**
- Kuçikên xew**ar**

– rendêrên pêkhatî ku bi paşgira **-î**'yê ji lêkeran çê bûne jî weke rendêr tên bikaranîn.

**Mînak:**

- Nanê şewit**î**
- Ava keland**î**
- Hevalê çûy**î**
- Zilamê geryay**î**

---

[15] Prof. Dr. Kadri Yildirim Kûrtçe Dil Bilgisi, Mardin Artuklu Üniversitesi Yayınları, Eylül 2012, r.248

### 1.7.3. Rengdêrên Hevdudanî

Ev rengdêr herî kêm du bêjeyan hatine çê kirin.

**Mînak:**

- yara <u>xem-revîn</u>,
- Reşhardê <u>Kezep-şêr</u>,
- bajarê <u>xwîn-mij</u>,
- gurê <u>çav-sor</u>

# BEŞA DUYEM

# ÇÎROKA XEBATÊ

## 2.1. MELE BEZA

Dibê mele beza hebû heft biznê wî hebû, heft biznê wî hebû û biznê wî timî diketin nav zadê xelkê, xelk rehetsiz dikirin. Û dibê rokê xelkê jêr go mele beza wele biznê te dikevi zadê me û biznê te zade me gişî dixwin. Dibê deri şirîtek dirêj dikeri wek mesela erdê me li nav mesela emê bên bist gav li dûrî zada yi deri şirîtek dirêj dikeri û davêji çembilê derî û dibê bineri vayi biznê mi girêdayî nin ,girêdayî nin jî disa zad dixwin.

Rokê yek dibê wele em nikarin bi mele beza bi şiklekî emê xwe ji van biznê mele beza xelas bikin. Radibi deri gurekî digri û nêrîyekî şerjêdiki û i'yarê gur di nerî digerîni û dibê mele beza ; dibê çi,dibê vele mele beza nêriyek jibo bizinê mi jmire lazimi dibe nêriyek li cemte tini? Dibê wele çi nêriyekî delal li cem mi heye ; bine nêriyê mi jî şertêwî eve, gerek tê wan di hindir xi biznê xwe heft roja û heft şeva tu derî li wan venaki, roja hefta tê derî li wan veki tê bineri gi biznê te giş nêrî xwarinin û wê j'ter herkê karekî bînin dibê vaya biznê xwe dixi hindir û ava wan û êmê wan li ber wan datîni û heya heftakê derî li wan venaki. Carekê derî vediki dineri nêrî tenê şipyayî yi û bizin giş berate li erdênin giş mirinin. Yaw dibê viya çi kir ji mi dibê heyla mîratmayo dibê ma bizin giş mirin ma tu tenê ma? Çawa deste xwe davêji nêrî dineri gi hema i'yar ma û gur go xirp ji nav i'yar derket û reviya , reviya reviya çû bera pê gur da û gur ket hindirê qulê; û li ber devê qulê runişt û wek mesela li ser riya dikê rûnişt û qula gur li wê dera yi li ser devê qule runişt.Go nerî yek di wir çû rêwiyek derbas bû yekî wek te derbas bû go; filankes go ha go tê her kerikê? Go erê wele ezê herim kerikê go de tu çû kerikê go silaba li pîreka mi ki go gi xwedête'ala lawikek dayê, go gi lawikê wê mezin bû go bera jmi re şerbikek av û bera nanekî bîni. Gur go heylo heylo! go hîna jina te bi halkî yi,hîna wê xwedê lawikek î bidê go ezê di virde ji birçîna bimrim. Yabo go bext bidi mi go ezê derkevim. Go bext jtere go derkevi, go bext jtere go derkevi, go rabû derket wî jî eyn ew gur girt û eynê 'iyarekî bizina kişandê û îja wê fena li xelkê biki. Wî jî eynê werê ji xelkê ri go go wele çi nêrî li cem mi heyi! Yek jî ji xwer li nêrîyekî digeri wî jî go wele va nêriyek li cem mi heyi eyn wî jî wek mele beza kir go bine ava heft roja û êmê heft roja bidê û heya heftakî derî li wan veneki û tê bineri va biznê te

nêrî xawrinin û temam. Û gurê xwe firot.Viya wî nasnaki mesela ji gundekî yi gi firot û pê ve viya jî eyn wek mele beza xelkê çawa fen li mele beza kir mele beza jî werê fen li xelkê kir. Çû derî vekir  nerî heft bizin li erdênin û gur tenê şipyayî yi nizani gur i, dibê qey nêrî yi. Gi çawa destê xwe avêtê gur go xirp û reviya û nerî i'yar di destê vî di ma. Reviya riviya gur ne girt mele beza jî zani mele beza gur fitotê zani yanî ew gurê xelkê firot mele beza ,mele beza jî firot hinkî dinê mele beza go bi xwedê wê îro xwedyê bizina bê go ezê bi şiklekî go çekê jina xwe li xwe kir û li jina xwe xist wê şand mala bavê wê. Û li ber derî rûnişt û rahişt tayê xwe û rahişt derziya xwe û li ber derî rûnişt ket mitala yanî va zilamê wê ne li mali. Nerî xwedyê gi gur firotiyê go roja te bi xêr xwakê; go bi xêr û silamet ser çava yabo,ê go xêri tu li çi diğeri? Go ka zilamê te? Go wele zilamê mi go yabo go bi xwedê çû, îro çend ro ez nizanim cî û warê wî li kuyi. Ew mele beza bixwe yi ha! çekê pîreka lê yi xwedyê bizina ji wî sewal diki. Rabû jêr go, go xwakê vele ezê te bivim ji dêvla bizina çunkî zilamê te fen li mi kiriyî heft biznê mi miriyi. Go yabo ez pîrek im tê mi biv ku? Go de hema ez jî bavê te tu jî qiza mi û ezê te bivim ji dêvla bizina,heya zilamê te bê. Go yabo tê mi bivi ku? Go gu ez tenevim zilamê te nayê. Go gu ez te bivim ewê bera pê te di û mele beza bir û çû. Mele beza zilam i, nizani gu zilam i. Mele beza go rabû go yabo ezê îro li cem kîjan xweha xwe rakevim ezê îşev li ku rakevim. Go hema li cem xweha xwe yî mezin rakevi. Nizani gi zilam i qurmiçyo! Welhasil wî û xweha xweyî mezin hinek sakinca wê heyi go ji xwer tişt mişt gotin ,go bû sibe go ezê îro li cem kê rakevim? Go wele wêya xewa wê ne xweş bû go wêya pir pê'n davêtin  ê go ezê li cem a ortê rakevim ,a ortê jî eynê şekilde ,û a biçûk jî eynê şekilde, di hersiya jî di mele beza fen li wan kir. Çawa fen li xelkê kirî yi li wan jî kir. Rabû go iro ezê li cem ca xwe rakevim li cem ca xwe jî raket eynê şekilde, vana sibê çû ser çem çûn çeka bişon rabû jêr go xwakê navê jina xwe li xwe kiriyi go tu jî nayê? go na wele go îro serê mi diêşi go ezê li malê bim. Go ezê li malê bim vana jî çû ser çem çûn çeka ,bavê wan û mele beza tenê li malê man go ban kir go baba baba! go gundiya hevdû kûştin. Go baba serêxwe kir şibakê tiştek bi baba kir, baba go wêêêêw! go ev qurmiçî ,go ev şeytanî giş li mi kiriyi û rahişt şekala  hatê û mele beza reviya reviya wele hat hindir, mele beza hat hindir jibo jina wî û qîzê wî pê nehisin êvarî mirîşkek serjêkirin herkê para xwe rahiştên û herkê go ê mi para mi ji birêmi re û wî jî go êmi para mi ji birê mi re. Ev giş dide mele beza para xwe bavê wan rabû para xwê jî danî ber wan go nîha yi we hemiya nîha yi mi jî.Welhasilî wexta werê nego? qurmiçyo go xirp û reviya ji hindir; derket hespa wan jderve bû li hespa xwe siwar bû û reviya,

reviya reviya nerî zilamek î yaşlî û dihurgurî rebeno li mi’îna xwe yi. Go ha apo go çi go bi xwedê go ez zanim tu dibê ezê herim jxwer lawabo û tu dibê niha ez herim lawabo tu dibê ewê mi’îna mi birevîn i. go hema serê mi’îna xwe bide mi û jxwer here lawabo. Go law lawkê mi dev ji mi berdi go ez narim lawabo. Go na na go serê mi’înê berda go apo hebkî jê qetiya çû viya hêdî apo hişt li mi’îna wî siyar bû û a din jî avet pê xwe û reviya û çû. Ê fena yi sadece fena li xelkê diki. Welhasil çû çû nerî yek barê wî dims i jxwer li pê kera xwe yi her dû aliyê kera wî barê wi dims i. Go ha apo go çi go barê te çi yi? go barê mi dims i. Ê go wele ez dimsa te ta’m bikim gi dimsa te xweş bi ezê barê te herdû aliya jî bikerim. Mesela emê bê du galonê yek viyalî yek viyalî hêdî devê meşkekê vekir ta’m kir û devê wê meşkê kir destê wî go bine bernedi ha! go ezê a din ta’m bikim. Devê a din jî vekir a din jî pê û adin pê dahf da û destek devê vê meşkê û destek devê vê meşkê û apo; Ay li minê û wax li minê go ez dimsê bedrim dims çû! go wax liminê tişt mişt digotin go ez dimsê bedrim dims çû! go ez dimsê bernedim vî qurmiçiya çi diki! Go rabû welhasil çû. Mele reviya û xwedyê dimsê jî xapand, û xwedyê bergîlê jî xapand.

Nerî yekî cotkarî liserê erdê xwe yi cot diki; Go bi xwedê bisekini go ez viya jî nexapînim?  go son viya jî ezê bixapînim. Rabû çû jêr go, go apo hinek paçik maçik xist ber zikê xwe, xwe kir wek pîreka bihalkî go apo go xwedê şte razî bi go ez dikim doxim bikim, go gelo ezê li ku doxim  bikim? Go law haway şkeftek li serê serseda mini go bera ev jî xêrami bi her her wê dera . Ciyê lê nan man dixwi go rabû viya çû şkeftê paçik maçikê xwe giş vekir, zani wê jina apo nîro jêr nan bîni. Viya jina wî nîro jêr şerbikek ava cemidî û hêkê qelandî anî. Hîn jina wî li dûrî wî yi go keçê ji mir nan nîni nîni. Go çir kuro go ma tu xeyidiyi? Go na na ez ne xeyidî mim go wa yekê li sersed a mi doxim kirî yi go bi xêra mi bivi jêr bera ew bixwi. Go ka li ku yi? Go li wê çolê wayi. Wele berê wê dayê mêrik cotê xwe diki, jinik jî çû cem mele beza. Mele beza têr hêkê xwe xwar û ava cemidî jî vexwar û êrişî jinikê kir. Jinik çû serê cêrî go, kuro niyera niyera, go qîza kûçik xwedê bihêli, xwedê bihêli, go kuro ez ji tere dibêm niyera go tu dibê xwedê bihêli. Welhasil tişt mişt jêr gotin wele viya hat go kuro go ma zilam bû go ne pîrek bû. Go bira keçe? Go te ji mir go zilam bû go mi go qeyn lawik çêbûyi. Go ma mi çi zanî bû  tu werê dibêji. Rabû çû çû reviya ji ber viya jî reviya go ez fenê li yekîdi jî bikim.

Çû cem yekî, go bira! go ha! yaw go du mi’în bi mi re nin go zikê mi ji birçîna diêşi. Go tu zani ez wan bi çi didim? Go tu bi çi didi? Go tu beroşek şorbe ji mir çêki û

bîni go ezê herdû mi’îna jî bitedim. Go kuro bi beroşek şorbe? go erê, go bise ezê ji dêvla te cot bikim go ji mêrik re go tu heri malê jmir şorbê çêki go ezê ji dêvla te çot bikim. Û go heta tu weri. Viya rabû çû ji jina xwer go, go keçê tu şorbê bidi ser ’’tedî dibê hîna mi’în tüne yi alifa çêdiki’’ dibê ji jina xwer dibê keçê li cem ciyê ga emê alifa mi’înê çêkin û ezê li vir bisekinim. Û emê pê’na bavên bê hela mi’în û ga dighên hevdû? Dibê jina wî jî bihalki yi dibê jina wî li wir sekinî yi dibê pê’nek di jinaxwed lêxist dibê jina xwe jî beravêtî kir û çû. Dibê rabû jêr şorbe bera kwîz da û kwîz da ser piyê xwe ,go law law go hey te li mi werê kir go hema bera tişkî mala bavê mi jî têdi hebi. Go hema tiştekî ji vê mi’înê bidi mala bavê mi jî. yanî xwe li darik daqûl kir go wele ez vî darikî jî nadim mala bavê te, kwîzê şorbê jî go gur li ser squlîka wî rijiya û rabû serxwe. Rabû hat li serê sedê nerî; heylooo! gi ne mi’în heyi gi ne ga heyi , ga biriyi û mi’în tuneyi û bi serê masata wî jî rîtî yi. xelkê go kuro hela te mi’în bir bir, te ga bir go te çawa çû şûna wî danî law ev tu şeytan bû tu çi bû? Kuro go ê li xelkê fena biki zani wê çawa biki.

## BEŞA SÊYEM

## 3. DI ÇÎROKAN DE NÎŞANDANA RENGDÊRAN

### 3.1.Di ÇÎROKA MELE BEZA DE RENGDÊR

#### 3.1.1. Rengdêrên Çawaniyê

**Mînak**: Nêriyekî delal,Pîreka bihalki, Ava cemidî, Xweha mezin,Hêkê qelandî, Dimsa xweş, Zilamê yaşlî,Şirîtek dirêj

**Hişyarî**: Bêjeyên ; Rebeno, Berate, Beravêtî, di vê çîrokê de derbas dibin eslê xwe rengdêr in; lê di vê çîrokê de wek navdêran hatine bikar anîn.

#### 3.1.1.1. Rengdêrên Namdariyê

**Hişyarî:** Bêjeyên; mele, qîz,jin di eslê xwe rengdêrên namdariyê ne; lê di vê çîrokê de wek navdêran hatine bikar anîn.

#### 3.1.2. RENGDÊRÊN DIYARKER

#### 3.1.2.1. Rengdêrên Nîşanîyê

**Mînak**: Vê mi'înê, Ew gur, Van biznê, Vi zilama

#### 3.1.2.2 Rengdêrên Jimarîn

#### 3.1.2.2.1 Rengdêrên Jimarîn yên Resen

**Mînak**: Heft bizin, Heft şev, Heft roj, Du mi'în

#### 3.1.2.2.2 Rengdêrên Jimarîn yên Kesrî

**Mînak**: Xweha Ortê, Xweha Mezin

#### 3.1.2.3 Rengdêrên Nediyar

**Mînak**: Hemiya, Filankes, Her, çi

#### 3.1.2.4. Rengdêrên Pirsiyariyê

**Mînak.** kîjan xweh , çi nêrî

### 3.1.3.Ravekên Rengdêran

**Mînak.** Ava cemidî, Hêkê qelandî

### 3.1.4.Li gor Sazbûna Xwe Rengdêr

#### 3.1.4.1. Rengdêrên Xwerû

**Mînak:** Dirêj, Wi, Wê, Wan, Ew, Du, Çi, Şev, Roj

#### 3.1.4.2. Rengdêrên Darijtî

**Mînak:** di-hurgurî , ber-avêtî , bi-halkî

#### 3.1.4.3. Rengdêrên Hevdûdanî

**Mînak.** xwedê-te’ala ,

# ENCAM

Di wê xebatê de rengdêrên devoka Mêrdî-Koserê hatine nirxandin. Hatiye dîtîn ku ji bilî guherîna hin dengan pê ve cudatiyên mezin tune ne. Lê cudatiya hin tiştan jî heye.

Rengdêrên nîşaniyê yên tevandî vî, vê; wî, wê wek ewi, ewê; evi, evê tê bikaranîn.

Rengdêra nîşaniyê ya pirjimar wan, van qertafa di daviya xwe dê dêxe dibe wa, va. Di devoka Koserê de ku li wan çîrokan jî diyare pêş daçek dikevin. Ew jî dibe sedemê bikaranîna rengdêrên kurt. Ew tişte ji ber lez gotinê û hevokên kurt çêdibe.

Li gor nirxandinê û mînakên hatine bijartin rengdêr piranî xwerû hatine bikaranîn. Ew yek ji ber lez gotina çîrokan jî derketiye holê. Lez gotin jî hêmanek çîrokê ya girîng e.

Ev nirxandin, li gor çavkaniyên girîng ku yên li ser kurmancî hatine kirin referans hatiye standin. Encamên vê xebatê di bin serenavên giştî de hatiye rêzkirin. Girîngiya vê xebatê jî ev e ku li ser vê devokê rêya lêkolînên nû dê veketin.

# PÊVEK

**CD**

**a)** Tez

**b)** Qeyda deng a çîrokên di metnên xebatê.

# ÇAVKANÎ

## PIRTÛK


- Prof. Dr. Kadri Yildirim Kûrtçe Dil Bilgisi, Mardin Artuklu Üniversitesi Yayınları, Eylül 2013
- Sami Tan Rêzimana Kurmancî, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Adar 2011 Mikail Bülbül & Bahoz Baran, Rêzimana Kuramncî Enstîtuya Kurdî ya Amadê, 2008
- Kamuran Bedırxan, Kolay Kürtçe, Doz Yayınları
- Celadet Alî Bedirxan & Roger Lescot, Kürtçe Gramer, Avesta Yayınları, 2009 İstanbul  Qanatê Kurdo, Rêzimana Kurdî, Kurmancî-Soranî, Nûbihar, 2013 Stenbol
- Abdullah Încekan Ez Kurdî Hîndibim- Pratik Kürtçe Dersleri, Nûbihar, Aralık 2010 Stenbol
- Çetin Taş, Waneyên Rêziman û Rastnivîsa Kurmancî, Dîwan, Stenbol 2013

**VEBÊJÊ ÇİROKÊ**

| | |
|---|---|
| Nav û paşnav | : Fatima KILINÇ |
| Cih û dîroka jidayikbûnê | : Dikkê |
| Asta perwerdehiyê | : Ne xwende ye |
| Navnîşan | : Gundê Mesta |
| Çîroka ku vegotiye | : Mele Beza / 12:42 deqîqeye |
| Çavkaniyên wî | : Çirokbêjên Koserê |
| Dever | : Mêrdîn/Koser |
| Mêjûya berhevkirinê | : 2016 |
| Nav û paşnavê berhevkar | : Hesenê Eyo |